# Çend bîr û bawerî li ser rûdanên Kurdistana Jêrîn de

Di tevaya xwebata Kurdistanêyî dirêj de ji sala 1514 de hêjî weha diyar û bi kêr ve mîna van rûdanên nihayî Kurdistanê ji bona çarekirina Pirsiyarîya Kurdistanê bi şêweyekî wetov bilnd ve nehatine dîtin. Belê ev vê carê rast û durust bi saya siyata çewtî Dewleta Surî û Iranê ve û herwehajî ligel karên xwînavîyî Abdela Ocelan û Celal Talebanî de têtê kirin.
Qonaxa Yekem di roja 17. avdara sala 1988 de bi avêtina Bombên Kimyawî ve ji bona qirkirina bajarê Helebçe hate destpêkirin, ya ku di encamê wê de der sala 1992 de li paş cenga Derava Farîse de Dewleta Iraqîyî Nawendî hate rûxandin û Dewleta Fêderasyona Kurdistanê hate damezirandin. Ev jî bi saya Xebata Miletê Kurdî xwînavîyî dirêj ve û bi saya Sîwana parastina Dewletên Hevalbend ve û herwehajî bi sozdana Peymana wan ve beramberî parastina Dewleta Fêderasyonîyî Kurdistana jêrîn de hate dîtin. Belê ji wê roja pîroz de tevaya Neşînvanên Kurdistanê bi carekê ve bi Dewleta xweyî Fêderasyonî perest û bi Parlemana xweyî pîroz ve hatin bextiyarîkirin. Bes û bi tenha ve Dagîrkirên Kurdistanê û PKK hatin hêç û harkirin. Dewleta Iraqî, Surî û Iranê bi Partîya Ocelan ji bona dadana tenûra cengê li ser Dewleta nuhî hêvîya Kurdan pê datin palpêdan û fermankirin: Ji ber vê jî Parleman û Dewleta Kurdistanêyî Fêderasyon bi neçarî ve der sala 1992 de Fermana Mafyozên Teroristên PKK li Kurdistan Jêrîn de dane derxistin, ew bi Şermezarî ve datin tarûmarkirin û ew di nava tevaya Kurdistanê de li ser wê Tawankarîya wan de nala Nokeran û xwefiroşan hatin rûsar û rûreşkirin. Belam Dewletên dagîrkirên Kurdistanê bi xweşî ve dev ji Dewleta Kurdistanêyî Fêderasyon nedan berdan. Wan Kombûnên xwe li Tehranê, Enqera û Şamê de dane kirin, da ku ew wê hêvîya Kurdan bidin linavbirin. Belam ji wan re Dewletên Hevalbend rast û durust dane zanîn, ku ew divên destên xwe ji bona nava Kurdistana Jêrîn nedin dirêjkirin, ji ber ku ew berjewendî û ewlebûna wan didin tengalkirin. Der gulana sala 1994 de ji ber nêzîkbûna helbijartina Demokrasî di nava Dewleta Fêderasyon de Yekitîya Neştimanî agirê Cenga man û nemanê di nava Kurdistana birîndar û nedar de bi cengeke navxweyî ve date vêxstin, da ku ew bi şêweyîkî Polpotî ve li ser xwîna bi hezaran ji Kurdan ve û wêrankirin û berbatkirina Kurdistanê bide serdarîkirin. Di nava pêşveçûna rûdanên şer de roj bi roj ve lawîzîya Polpotê Kurdistanê Celal Talebanî bêtir û bêtir ji tevaya dunyayê re hate derkevtin. Hemû pêrabûnên xêrxwazên Partî, Sazmendî û Merovên bi nav û bangên Kurdistanê ji bona çarekirina pirsê bi şêweyekî demokrasî, bajarvanî û aşîtî ve ji bal Yekîtîya Neştimanî de hatin berbadkirin.
Dewleta Emerikî, Dewleta Turkî û INC Iraqî civînek li Irlenda de li bajarê Deblin de di 11. Tebaxa sala 1995 de datin likarxistin, da ku pirsa cenga navxweyî li Kurdistana jêrin de bête bidawîkirin û bi şêweyekî demokrasî tevaya pirsên rûkirî li rastê de bêtin çarekirin. Ev Çar bendên hanê di wê civînê de ji bona çarekirina pirsê bi bingehî ve hatin hîmkirin:

1. Bêsipahîkirina Bajarê Hewlêrê nala gava kilîta pêşî,
2. Pêkanîna Encumeke bêlayîn ji bona çavdêrîya di bin sîwana ICN,
3. Bipaşvegerandina Hêzên Çekdar ji dor û berên Hewlêrê ji bo cihên ji wan re nîşankirî
4. Lênerîn ji bo hemû hatinên Diravî wergirtî ji bal Partîyan de ji 1. Gula Sala 1994 de
5. Ev hemû biryarîyên hanê li jêr guhpêdana Yekitîya Zemînîya Iraqê û Berjewendîyên Ewlebûna Turkîyî Rewa têtin dîtin.

Tevaya Xelkên Kurdistanê bi van bendan hatin bextiyarîkirin. Hemû Partî, Sazmendî û Mirovên bi nav û bangên Kurdistanê bi wan lihevhatinan ve hatin şakirin û wan ji dil û can pişta wan dane girtin û hêjî bêtir wan ji bona biciânîna wan ji herdu Partîyan dane daxwazkirin; ji ber ku di nav rêz û dêrên wan bendan de hêvîya çarekirina aşîtîyî pirsê û hajbûna Milî bi xurtî ve dihatin derkevtin. Hêjî bêtir têde jî tevaya berjewendîya Netewê kurdî perçekirî ji bona mafeyên wîyî rewa û piştgirtina wî ji bal tevaya bîr û bawerîya cîhanî

de dihate derkevtin.
Belam vê carî jî û ji hercar bêtir notir jî Dewleta Iran û Surî hatin hêç û harkirin û bi lez û bez ve wan ji bona PKK bi şerekî xwînavîyî pirî bitirs ve ji bona nava Kurdistana Jêrîn di 25/26 meha Tebaxa sala 1995 de datin fermankirin, da ku ew ji bona hewara Yekitîya Netîşmanî de dijî partîya Demokratî Kurdistan bidin cengkirin. Wan bi vî rengê hanê ve ew şerê xweyî veşartî dijî Fêderasyon, Berjewendî û ewlebûna Dewletên Hevalbend û Turkî datin eşkerekirin. Di civîna duwemî Deblinê de di 13 Ilonê sala 1995 de Yekîtîya Neştîmanî xwe ji bendên civîna pêşîn de didan vedizandin û bigir ew bê encam hate derkevtin.
Bi vî rengê hanê ve rast û durust qonaxa duwemî Pirsa Kurdistanê bi hemû xurtbûn û gûrbûna xwe ve date destpêkirin. Wetov ji nişkêve û bi eşkere û diyar ve Du Bendên raserî hev hatin derkevtin. Benda Yekem ji Partîya Demokratî Kurdistan, Dewletên Hevalbend bi Serokitîya Emerîka, Dewleta Turkî, INC Iraqî û dûr yan nêzîk ji hemû Partî, Sazmendîyên Kurdistanê û Merovên bi nav û bangên Kurd ve hate pêk hatin, yên ku ew dixwazin û jêre jî didin xebatkirin, ku li ser bingehên bendên civîna Deblin de Pirsên Kurdistana Jêrin bêtin çarekirin. Benda Duwen ji Yekitîya Neştimanî, PKK, Dewleta Iranê, Suri û Iraqê tête pêkhatin, yên ku ew dixwazin van bingehên Bendên Civîna Deblin bidin tar û markirin û şerê man û nemanê li Kurdistanê de bidin gûrkirin, da ku rast û durust Dewleta Fêderasyona hêvîya Kurd bête nemankirin û Berjewendî û Ewlebûna Dewletên hevalbend û Turkî jî bi bin piyan ve bidin xistin. Vêna rast û durst bi Navdewletkirina Pirsa Kurdistanê date kirin. Belê Merov destpêka wêna ji xwe re bi hemû agirên pê ve dide dîtin û ji nû ve careke din belam vê carê jî hêjî xurttir û bi kêrtir ve ji cara li paş Cenga Derava Farisî de veguhertinên di nava wê de ji xwe re dide dîtin. Belê piranîya Partî, Sazmendîyên Kurdistanê û Merovên wêyî bi nav û bang ve kar û barên PKK bi xurtî ve dane tawankarkirin. Hêjî bêtir piranîya Dost û Hevalên Yekîtîya Neştîmanî dijî vê Hevalbedîtîya wan ligel PKK tûrebûna xwe dane derxistin û ew rast û durust xwe ji wan didin vegirtin. Ev Hevalbendîtîya perestî PKK û Yekitîya Neştîmanî dijî armancên bingegehî rewayî xebata Kurdistanê hîç gûman têde nayête dîtin, ku ew dê ji bal tevaya bîr û bawerîya Xelkên Kurdistanê bête tawanbarkirin û ew di encamê dawî de dê rast û durust bi vî karê xweyî dir û hovî dijî berjewendîya Netewê Kurdistanê bêtin tarûmarkirin. Bes û bi tenha ve yek cî ji wan re dê li ser zemînê de bête dîtin, ew jî dê li nik Efleqê Faşîyê Ereb û Xilxalîyê Axundeyê Xişxaşkêşî Iranî de bête dîtin. Gelo Celal Talebanî û herwehajî Hevalbendê wî Abdela Ocelan rojekê ji rojan weha xwe di tengavîyeke wetov de dane dîtin? Bêgûman belkî Celal Talebanî bi jîrbûna xwe ve, lêbelê pir bi lawazî ve xwe ji nava vê pirika kevtî ve bide rizgarkirin, lêbelê PKK û Abdela Ocelan ji niha de Merov dikare bide gotin, ku wan ev şerê xwe nala Partîyêkê di seranserî Kurdistanê de dane dûrandin û ew bes û bi tenh ve dikarin nala Sazmendîyeke Mafyayî Teroristî bidin jîyandin, ya ku ew nebes tenê ji bal Kurdan ve dê li dû wan de bête gerandin, lêbelê dê nala Terorisatan û Mafyozan ji bal Interpol de li dû wan de li seranserî dunyayê de bête gerandin. Ji niha ve vaye fermana wan li Kurdistana jêrîn de hatîye rakirin û dê ew di nava destarê aşê nemanê de bêtin hêrandin û hêjî bêtir Fermana wan nala Teroristan û Mafyozan jî li Elamanya jî hatîye rakirin. Magelo ne bi başî ve ji bona Partîya Demokartî Kurdistan têtê dîtin, ku ew PKK û Yekitîya Neştîmanî ji dil û can ji bona vê Hevalbendîtîya wanî perest bide pîrozkirin? Tev li van hemûyan jî de yek daxwaz têtê dîtin, ku ew jî pirsa Kurd di Kurdistanê Jêrîn de li ser bingehê Bendên Civîna Deblin de bêtin çarekirin. Herwehajî em hêvîdarin ku Dewletên Hemsayên me ji Surî û Iranê dê nala bi serhatina Sedam ve li xwe de nedin kirin û ew dê destdirêjîya xwe ji nava Kurdistana jêrîn bidin kişandin; ji ber ku ew ne ligel Kurd de, belam ew rast û durust ligel Hevalbendan û Turkan de didin şerkirin.

Partîya Demokratî Kurdistan –Liqê Ewropa– di 9. 10. 1995 de